

Berpêşana Me

- Beşepirtûkxaneya pîrrzimanî û hwd. mijarên di ware kurdnasî, kurdên li almanyayê, mîgrasyon/integrasyon, îrak, êran, sûrî û tirkiye
- Heyiyeke mezin e pîrrzimanî di warên pirtûk, rojname, dokumentasyon, nivîsên çapemeniyê û weşanên zanistî yên dîrokî û rojanî de
- Wêjevekolîn und peywira serwestkirinê
- Arşîva çapemenî ya rojname û kovaran
- Handana armanckirina lêkolînan û weşanan
- Komcivîn, seminar, workshop, amadekirina çalakiyan
- Liserkarkirina pirsên vekolînan û peydakirina axêveran
- Handana danûstendina çandî di navbera kurd, alman û mîgrantên din de di warê lihevkerinê de
- Amadekirina arşîveke dijîtal e bê asteng

Agahî

Piştgiriya Projeyê:

Ministerium für Arbeit,
Integration und Soziales
des Landes Nordrhein-Westfalen



Bervêder

Daniel Steils
E-Mail: daniel.steils@navend.de

Sahin Kürküt
E-Mail: sahin.kurkut@navend.de

Dem

Duşem: 9:00 – 17:00
Sêşem: 9:00 – 17:00
Pêncşem: 9:00 – 17:00

Çarşem û îni: Bi tenê piştî jîvandanê

Hoyên Bikaranînê

Bikêranîna pirtûkxanê bêmişe ye. Endamtiya komelê ne pêwist e.

Raykirin (niha) ne gengaz e.
Derfetê jibergirtinê heye (bi bihaya xwe).

NAVEND – Zentrum für Kurdische Studien

NAVEND – Navend ji bo Lêkolînan Kurdî


Bornheimer Str. 20-22, D-53111 Bonn

Tel.: +49 228 - 65 29 00
Fax: +49 228 - 65 29 09

E-Mail: info@navend.de
Web: www.navend.de



Arşîva Pirtûkxaneyê Peywira Zanegehê



Pirtûkxane

Pirtûkxane ji bo kesên pêwendîdar heyiyeke berfireh ji weşan û endamên ragihandinê, yê cûr bi cûr, pêşkeş dike. Vê berpêşana wêje û ragihandinê divê tevkarî ji bo handana danûstandineke çandî, ku bingeha xwe zanîna e, çêbike.

Pirtûkên nû bi riya xwendinên nivîskarî û bi riya axaftinên li serê, tèn nasandin û Workshopên ku giraniyên xwe ji hev cihê, weke mînak navbendîya teknîkên lêkolîn, şarezayîya ragihandin an karên jêdervekolînê, tèn birêvekirin.

Heyiya di der barê pirtûkên fêrkirinê û ferhengên bi zimanê kurdî de tim tê zêdekirin û divê ew li herêma Nordrhein-Westfalenê piştigiriya waneyên bi zimanê zikmakî bike.

Kesên ku bixwazin ji dîrok û rewşa niha ya kurdan agahdar bibin; dikarin li NAVENDê arşîveke berfireh, ku tim xurttir dibe, bîvînin. Di nava vê berpêşana agahiyên de ev tèn wergirtin:

- Gotar û weşanên zanistî
- Belavokên civînan
- Weşanên ji herêmên kurdan
- Rojname û kovarên navnetweyî (û yên dezgeh, komele û hwd. yên kurdan)
- Fîlm û muzîk
- Roman û helbest
- Agahiyên li ser civata dîni di civaka kurdan de
- Wejeya mişext
- Hêmanên waneyên bi zimanê zikmakî ji bo kurdî û
- Pirtûkên zar û ciwanan

Derfetên Lêkolînê

Berpêşanên NAVENDê berê xwe didin ev kesan:

- Niştimanevanên pêwendar
- Xwendekar
- Zanyar
- Pisporek, mamoste û hêvojer
- Rojnameger
- Amojgarî û merciyên fermî
- Karsazî

Em bi taybet di der barê jêderên zanistî bi almanî, kurdî, erebî, frensî, inglîzî û her wekî zimanên din de heyiyekê mezin pêşkeş dikin.

Berpêşana me ji xwe re dike armanc, ku van jêderan vebike, ango berfireh bike, saz bike, serûber bike û vê arşîva dokumentan veguhêze pirtûkxaneyeye gelemper, da ku bikarhêner çêtir û hêsan rabigihên. Her wiha pêşvebirin û nûkirina vê berpêşanê û pê re jî bi taybet dijîtalkirin tèn derpêşkirin. Armanc ew e ku, di pêş de bi sazûmana pirtûkxaneya gelemper ve girêdanek bê çêkirin.

Li ser vî, birkeke agahiyê bi teşeya zanegehekê ji bo saziyan, zanyaran, zanîngehan, weqfan û mercên fermî derbikeve holê.

Mebest ew e ku, bi pirtûkxaneyên şaran, ên zanîngehan û yên derve re (û Enstîtûya Kurdî ya Parisê, Pirtûkxaneya Kurdî li Stokholmê, Enstîtûya Kurdî ya Waşîntonê) hevkarî bê danîn û derfetên raykirina têvel bîn xurtkirin.

Berfirehkirina sazûmaneke raykirinê ji bo pirtûkxanê tê plankirin. Heyiya ku jixwe amade ye dikare li gora rêzikên xwe di demên vekirî yên saziyê de bê bikaranîn.

Piştî nûkirina vê heyiya pirtûkxanê û bicîkirina weşanên nû, ev katalog dê bi pirtûkxaneyên gelemper ên şaran û yên zanîngehan ve bê girêdan. Bi vî awayî ev heyiya amade di ware Bonnê de di pêşerojê de ji bo vekolînên wêjeyî bikari be bikaranîn. Her wiha hat plankirin ku arşîva çapemenî bi teşeya dijîtal bê amadekirin ku bi vî awayî ev koma nivîsan li ser internetê jî bê dîtin û bê lêkolîn.

Piştigirî

Pirtûkxane peywireke misêwa ye û ji ber vî jî tim piştigirî divê. Arîkariya minêkar bi lîstîna heyîna pirtûkxanê, an jî bi beşîna pirtûkan, ango piştigirîya bi her awayî; ku ji we were, bi nîrxekî mezin dê bê pêşwazîkirin.

Hûn dikarin bi kurdî biaxivin û binivîsin? Heyiyeke mezin a pirtûkan di ware kurdî de heye, ku pêdivî bi kesên ku dikarin vana wergerînin heye.

Wekî din em li rojnamegerên ku nivîsan di arşîva me de aşkera bikin an jî bixwazin nîrxanên xwe li ser mijarên polîtîk û çandî binivîsin, digerin. Derveyî wî pêdivî bi şîrovekirina weşanên dîrokî û bicîkirina wan di konteksta rojanî de heye. Dibe ku ev, ji zanyar û rojnamegerên ciwan re tîketîna wêjeya heyî, hêsan bike.

Kesên ku zanîna û sihêtiyên wan di ware pirtûkxanê de hene, dê bi kêfxweşî bîn pêşwazîkirin, ji bo zanînan xwe parve bikin.